Nivîskar: Xulamek XUDAN

Her tiştên di derbarê baweriya Mesîh de

Kitêba Pîroz çi ye?
Xwedê Kî ye?
Guneh çi ye?
Îsa Mesîh kî ye?
Divê em bona xelasbûnê çi bikin?

Ji ber, Xwedê evqas pirr ji dinê hez kir ku, Lawê xwe yê yekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi Wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe. (Yûhena 3:16)

BI KURDÎ (Zaravayê Kurmancî)
Kurdish (Kurmanji Dialect)
Kurdisch (Kurmandschi Dialekt)

Hûn dikarin di derheqê wergerê de fikr û
ramanên xwe ji me re binivîsin:
© Hoffnung und Leben e. V.
Komela Hêvî û Jiyanê
Postfach 10 13 82 · 33513 Bielefeld · Germany
E-Mail: Incilkurd@web.de · www.Hoffnung-Leben.info

Werger: M.Sait Alpaslan & Resûlê Qereqoçanî
(Translated into Kurdish [Kurmanji]:
M.Sait Alpaslan & Resûlê Qereqoçanî)

NAVEROK

DESTPÊK	7
KITÊBA PÎROZ ÇI YE?	8
XWEDÊ KÎ YE?	14
GUNEH ÇI YE?	25
ÎSA MESÎH KÎ YE?	34
BONA XELASBÛNÊ DIVÊ EM ÇI BIKIN?	46

DESTPÊK

Nûçeyên di derbarê Xwedayê ku nayê dîtin, li her derê her cihî di hema demê de heye, hêza Wî têra her tiştî ye û bi her tiştî dizane, di pêvajoya demên dirêj de li her aliyê gerdûnê hatiye bihîstin. Ji reha gihayê ku tena xwe di quncika herî tarî de qam dide, heta darçiloyên xwurt ên di quntara çiyê de û ji qûmên rexên çeman, rojgerên gir yên ezmana tarî de û heta stêrkên ku dibiriqin her tişt qala Xwedayê Bilind dikin.

Xwedê di buhuştê de dijî, lê di mena demê de nêzîkî mirovan e. Dixwaze ku hemî mirov ji têkçûna abadîn xelas bibin û digel Wî di buhuştê de bin. Xwedê îroj bi gotina: "Ya hemû kesên westiyayî û bargiran, werin cem min û ez ê rehetiyê bidim we!" (Meta 11:28) bangî xort û kal, her kesî dike.

Xwedê kî ye? Em ê çawa biçin û bi rehetî Wî bibînin? Ên ku westiyayî ne û barên wan giran in kî ne? Bersiva hemî van pirsan di Kitêba Pîroz de ye. Vê pirtûka jî dê alîkar be ku hûn ramanên kûr ên di Kelama Xwedê de cih digirin fam bikin.

Ev pirtûk daxuyan dike ku, pêkhatina Kitêba Pîroz çawa ye û ka çima jê re dibêjin Kelama Xwedê, guneh çawa ketiye dinê, em dê çawa ji gunehê bikaribin xelas bibin û di derbarê rastiya ku Xelaskerê hemî mirovan Îsa Mesîh de ye, dike.

Em hêvîdar in ku dê di pêşveçûna we ya di baweriyê de dê ev pirtûk jî we bigehîne asteke nû û ji pirsên we re bibe bersiv.

KITÊBA PÎROZ ÇI YE?

"Xwe ji tiştên derveyî vana biparêze kurê min. Dawiya zêde pirtûk nivîsandinê nîne, zêde vekolîn jî bedenê dihincirîne. Her tişt hate bihîstin, encam ev e: Hurmetê nîşanî Xwedê bike, emirên Wî bîne cih. Ji ber ku peywira her mirovî ev e." *(Waiz 12:12,13)*

Ger hûn çûbin pirtûkxaneyekê, haya we ji pirrbûna cûreyên pirtûkan bûye! Hemî refikên pirtûkxaneyê, ji jor heta binî bi pirtûkên bidîmen, bêdîmen, rengînî an jî bêreng, zirav an jî stûr ve tijî ne.

Pêdiviya mirovan ji pirtûkan re hene. Di dibistanan de em ji pirtûkan hîn dibin. Pirtûk di jiyana me ya rojane de şîretên qenc didin me û bi navgîniya pirtûkan, em di derbarê dinya ku li dora me ye de fêrî gellek tiştî dibin. Kesekî bixwaze hê jî zêde fêr bibe, divê bizêdeyî pirtûkan bixwîne. Lê belê çi qasî dirêj bijî, bila bijî, tu kes nikare hemî pirtûkên li rûyêerdê ne bixwînin.

Lê hemî pirtûk ne qenc in. Gellek weşan her cûreyên xerabiyê didin hînkirin û jahr dide dil û mejiyê pirtûkan. Van pirtûkan azweriyên xerab didin dilê mirovan û mirovan ji Xwedê ve dûr dixînin. Divê em tenê pirtûkên peyxam dide mirovan bixwînin û bi pirtûkên xesarê bide ruhê me têkildar nebin.

Pirtûkek yekane ya li dinê bêhempa ye heye. Ev pirtûk ji nava pirtûkan ya herî girîng û birûmet e. Bêyî vê kitêba ku navê wê Kitêba Pîroz e, bi awayekî rast jiyîn

bêderfet e. Tu pirtûk bi wê re nayê berhevdanê. Divê xort û ciwan, her kes bizanibin ku di Kitêba Pîroz de çi hatiye nivîsandin. Ger we gellek pirtûkî xwendibin lê hê haya we ji naveroka Kitêba Pîroz ve nebûbe, we jiyana xwe vala jiyane.

Ma ya ku Kitêba Pîroz ji pirtûkên din ve seretatir dike çi ye?

KITÊBA PÎROZ KELAMA XWEDÊ YE

"Ji ber ku peyxamberî, tu carî bi viyana mirovan ve nehatiye; lê belê mirovên Xwedê yên pîroz, ji aliyê Ruhê Pîroz ve hatin birêvebirin û gotin."

(2. Pêtrûs 1:21)

Li dinê tu pirtûk ne mîna Kitêba Pîroz e. Nivîskarê Kitêba Pîroz ne mirovek, lê Xwedê bi xwe yî. Her tiştên ku Xwedê dixwaze mirov pê bizanibin di pelên wê de nivîsandî ne. Ji ber vê yekê navê Kelama Xwedê an jî Nivîsên Pîroz didin Kitêba Pîroz.

Kitêba Pîroz têdighîne ku Xwedê ezmanan, erdê û mirov çawa afirandine. Kitêba Pîroz ji me re têdighîne ku mirov çawa gune kir, Xwedê ji ber hezkirina xwe ya ji mirovan, bi navgîniya Lawê xwe Îsa Mesîh bona xelaskirina me çawa rêyek pêk aniye.

Di Kitêba Pîroz de 66 kitêbên cuda hene û navê her kitêbê, mînak "Eyûb", "Yûhena", "Nahûm" û "Îbraniyan" hene.

Xwedê Kitêba Pîroz bi destên xwe nenivîsandine, wekî nivîskarên Gotina Xwe kesên ji Wî hez dike û pîroz in bikar anîne. Peyxamê daye wan û bona ku binivîsînin zanyariyê daye wan.

Di nava van nivîskaran de mirovên rêze jî, mirovên gellekî sereta jî hene. Di nava kesên ku peyama Xwedê bidilsozî dinivîsin de qiralan, şivanan, nûjdareke Grêkî, masîvanên bêperwerde, rayedarên hikûmetê û kahînan jî hene.

Kitêba Pîroz di demên cüda de, bi zimanên cuda û li welatên cuda hatiye nivîsandin. Kitêba Pîroz mîna Peymana Kevin û Peymana Nû, bi du beşî ve cihê dibe. Di heman demê de navê Mizgînî an jî Încîlê didin Peymana Nû. Kitêbên pêşîn yên Peymana Kevin qandî 3500 sal berê hatine nivîsandin, lê belê Încîl, kêm û zêde 2000 sal berê hatiye nivîsandin. Çawa ku Kitêba Pîroz kitêbeke gellekî kevnare yî lê dîsa bona dema me jî gellekî girîng e û gotinên tê de ne, raman û wateyên xwe winda nekirine. Kitêba Pîroz ji hemî mirovên di pêvajoya demê de jiyane kitêbek bêhempa ye, ji ber ku tiştên di wê de nivîsandîne ji Xwedê bi xwe hatine!

1 – Ma çima navê Kelama Xwedê didin Kitêba Pîroz?

KITÊBA PÎROZ RASTIYA BÊQISÛR E

"Wan bi rastiyê ve pîroz bike! Û gotina te rastî ye."
(Yûhena 17:17)

Em ji zarokantiya xwe ve dizanin ku rastî rast e û tiştên nerast xelet in. Divê em bi rastiyê ve baweriyê bînin, ya nerast red bikin û pê bawer nebin.

Kelama Xwedê rastiyek bêqisûr e. Kelama Xwedê teqez rastî ye. Rastiya di derbarê mirovahî û guneh, Xwedê û abadînî, xelasî û Xelasker têdighîne de yî.

Her kes dikare di derbarê Kitêba Pîroz teqez rastî ye de ewle bibin û divê bi nivîsên di naveroka wê de ne bawer bin. Mînak, Îsa di Meta ll:28'an de: "Ya hemû kesên westiyayî û bargiran, werin cem min û ez ê rehetiyê bidim we!" dibêje. Dibe ku ew kesê westayî û barê wî giran e hûn bin, dibe ku barê gunehê û wicdaneke bisûc tahde li we dike. Ev ayeta, bona barê we yê gunehê rahêje û xweşiyê bide we, we bangî nêzikayiya Îsa dike. Her kesê ku birastî jî bi Kelama Xwedê ve baweriyê bîne dê aramî û xweşiyê bibîne. Yê ku baweriyê neaniye hê di bin barê gunehê de yî û di jiyana xwe de bêarmanc dijî.

Kitêba Pîroz bisedsalan berî kişfkirina çapxaneyê, bi desta hatibû nivîsandin. Yên ku Kitêba Pîroz kopî dikirin di derbarê mijara qet tu peyv an jî tîpekî jî neguherin de, gellekî balkêş bûn, ji ber ku Xwedê têgihandibû ku her kî tiştekî tevî Kelama Wî bike an jî tiştekî jê kêm bike, dê bi xedarî bête bicezakirin.

Di roja me de Kitêba Pîroz bi gellek zimanên li dinê ne hatiye wergerandin. Dîsa jî, ji ber ku naveroka wê ramanên pêşîn yên Kelama Xwedê ne, girîngiyê, rûmetê û populeriyê dide Kitêba Pîroz.

Bi nivîsên Kitêba Pîroz ve bawerbûn an jî bawer nebûna me rastiyê naguherîne. Xwedê derew nake û dê Kelama Wî teqez bête cih.

1 – Ji ber çi Kitêba Pîroz bi vebirî kitêbek rast e?

2 – Kitêba Pîroz kîjan rastiyê diyarî me dike?

KİTÊBA PÎROZ, KİTÊBEK DİKARE JİYANA MİROVAN BİGUHERÎNE YE

"Ji ber ku gotina Xwedê zindî ye û bi bandor e, ji her şûrê bi du devî hîn tûjtir e û heta can û ruh, mêjî û movikan ji hev û din cuda bike, dikare here kûrahiyê; armanc û ramanên dil, daraz dike." *(Îbraniyan 4:12)*

Xwedê çi karekî nûwaze kiriye! Hêza Ruhê Pîroz xistiye peyvên mirovî yên rêze û Kitêba Pîroz jî hatiye awaya Kelama rasteqîn û zindî. Kelam qalibên ramana her mirovî bi gunehê, bi Xwedê û bi têkiliyên bi mirovên din re dikare biguhere.

Gunehkarên cedewbûne, di bin bandora Kelama Xwedê de ji sûcên xwe tobe dikin û dibin mirovên pîroz. Qesas diguherin û dibin kesên birehm û hezkirinê ve

tijî ne. Derewçîn diguherin û êdî rastiyê dibêjin û dizek jî dev ji dizekiyê berdidin. Kelama Xwedê, di herî tengasiya jiyanê de xemrevîniyê li bawermendan dike û li hemberî mirinê hêviyê dide wan.

Kitêba Pîroz kitêbek xwedanî ye. Ruhê Pîroz wateya rasteqîn ya gotinên di Kitêba Pîroz de ne aşkere dike. Kesî herî perwerde dîtî jî, bêyî ronîdayîna Ruhê Pîroz, nikare wateya rasteqîn ya Kitêba Pîroz fam bike. Xwedê, yên ku dixwazin rastiyê bibînin dibîne û bi navgîniya Ruhê xweyî Pîroz, rastiyê ji yên ku lê digerin re vedike.

Bona ku hûn karê Kitêba Pîroz ya di jiyana we de yî bijîn, divê hûn wê bixwînin. Beriya xwendina Kitêba Pîroz, ji Xwedê ve, ji bo tiştên ku we xwendine fam bikin û bi Kelama Wî bawer bibin alîkariyê bixwazin. Kesê ku Kelama Xwedê dixwîne, bawer dibe û bitûmiya wê di jiyana xwe de tetbîq dike, kesê dilgeş e. Çima? Ji ber ku kesên Kelama Xwedê ya îlahî bixwînin, dikarin axaftina Xwedê ya bi wan re yî bibihîzin. Dê fêr bibin ku, bona di têkçûna abadîn de helaq nebin ka dê çawa bijîn û bi kê ve bawer bibin. Ev jî dê hêviya jiyana abadîn bide wan.

1 – Kitêba Pîroz jiyana mirovekî çawa diguherîne?

2 – Bona ku hûn bandora Kelama Xwedê di jiyana xwe de bijîn, divê hûn çi bikin?

XWEDÊ KÎ YE?

"Xwediyê bêmiriniyê tenê, yê ku di ronahiya ku mere nikare nêzîkî wê bibe de disekine, yê ku tu mirov wî ne dîtiye û ne jî dikare bibîne, dê wî di dema hatiye bi-jartin de derxîne holê; bila rûmet û qudreta bêdawî ji wî re be! Amîn." *(1. Tîmotêyos 6:16)*

Li rûyêerdê bi dibetiyek mezin tu kes nîne ku pêkhatina gerdûnê miraq nekiribe. Mirov ji ku hatine? Ma gelo Xwedê heye? Ger hebe kesekî çawa ye? Dema em li xwe û li dinya li dora xwe ne dinêrin, em bi gotina: "Ma gelo hemiyên vana çawa ava bûne?" difikirin. Diyar e ku heçî tiştên em dibînin ji aliyê mirovan nehatine avakirin. Wê gavê, ma gelo kî vana çêkirine?

Zivistanê, dema di berfê de şopên lingan dibînin, em dibêjin, "yek ji vê derbas bûye." Ger em nebînin jî yek ji wê derbas bûye jî, ji şopên lingan em dikarin fam bikin ku ew zarok e an mezin e an jî ajal e. Mîna vê yekê em dikarin di her tiştên ku li dora me ne de jî, "şopên lingên" Xwedayê mezin û zanyar e bibînin.

Qet tu kes Xwedê nedîtine. Xwedê ji aliyê mirovan ve nayê dîtin. Mîna me ne xwedî bedenê ye û li warek mirov nikarin bigihêjin de dijî. Xêzkirina Xwedê, an jî bi gotinan terîfkirina Wî bêderfet e, ji ber ku tu kes bi gotinên bilind û nûwaze, yên bilindahiya Wî, bi her tiştî zanîna Wî û xweşikiya Wî terîf bikin, nizanin. Çawa ku wisa ye, lê dîsa jî Xwedê bona ku di derbarê Wî de mirov hînî tiştan bibin û pê re pardariyê bikin pêkan daniye.

Pêdivî nîne ku mirov bona hînî kîbûna Xwedê bibe, biçe derekî. Tenê li xwe û li dinya li dora xwe nihêrtin bes e. Dema em bisekinin û nûwazebûna afirandina mirov bifikirin em di nava şamîtiya de dimînin. Civîk sibehan çi qasî xweş wîte wîtê dikin! Roj çawa bi awayekî rewnaqî bilind dibe! Roj û şev, havîn û zivistan çi qasî bizanyarî hatine afirandin! Her tişt çi qasî biaheng e! Zanyariya Xwedê di her tiştî de, bi vebirî di her tiştî de têtе dîtin.

1 – Ev Xwedayê mezin û xurt gelo kî ye?

XWEDÊ AFIRKER E

"Ji ber ku li erd û ezman, hemû tiştên xuya dibin û yên xuya nabin, textan, serweriyan, rêvebiriyan û hukimraniyan, her tişt di wî de hate afirandin; hemû tişt bi navgîniya wî û bona wî hatine afirandin."

(Kolosiyan 1:16)

"Rûyêerdê jî mirov û ajalên li ser dijîn jî min bi hêza xweyî mezin, bi destê xweyî şiyandar afirandin. Ez ê wê bidim kesê ku guncaw bibînim." *(Yêremya 27:5)*

Gelo we tu carî pirsa, ka kengî û çawa rûyêerdê, roj, heyv û stêrkan, deryayan û çeman, masiyên di avê de ne, civîkên li ezmanan e û ajalên di daristanê de ne pêk hatine û mirov ji ku hatine miraq kirin? Mînak, ma gelo çima havîn tim ne li pêy zivistanê, lê li pêy biharê tê? Ma gelo çima civîk payizê bi bi kişwerên germ

ve diçin û hirç berî ku hewa bicemide xewa zivistanê radizên? Rojgera me çima li dora rojê digere? Yê ku vê pergala tund û zanyarî daniye hemiya gerdûnê kî ye? Yê ku van zagonên naguherin danîne xwezayê kî ye?

Bersivên vê pirsê yên rast û durist, di Kitêba Pîroz de hatine dayîn. Kitêba Pîroz ji me re têdighîne ku Xwedê afirkirê her tiştan, yên xuya dibin an jî nabin e.

Ma gelo we nizanîbûn Xwedê her tiştî afirandine? Kitêba Pîroz ji me re wisa dibêje: "Ezmanan bi kelama XUDAN, cîsmên ezmanî bi hilma ku ji devê Wî derket hatin afirandin… Ji ber ku dema Wî got, her tişt bûn; dema Wî emir da her tişt diyar bûn" (Zebûr 33:6, 9). Bona Xwedayê hêza Wî têra her tiştî dike tenê gotin bes bû. Dema Xwedê gotinên xwe digotin erd pêkhatibû, çeman dest bi herikandinê kiribûn û behran gurmiyabûn. Dema Xwedê axifîbû ajalan afiribûn, li ezmanan civîk firiyabûn û di behrê de masî avjeniyê kiribûn. Xwedê, mirov ji axa erdê afirandibû, hilma jiyanê pifî pozê wî kiribû û wî danîbû cihekî nûwaze yê bi navê Bexça Adenê tête zanîn.

Yê ku hêza wî ji tunebûnê têra avakirina tiştekî ye tenê Xwedê ye

1 – Xwedê çi afirandiye

2 – Xwedê her tiştî çawa afirandiye?

XWEDÊ JIYANDÊR E

"Ruhê Xwedê min afirand, hilma Hêza Wî Têra Her Tiştî Dike jiyanê dide min." *(Eyûb 33:4)*

Ma gelo we tu carî yekî mirî dîtine? Mirî di nêrîna pêşîn de ji mirovan cihêtir xuya nabin. Seriyên wan, dest û pêyên wan hene. Dibe ku kincên moda ne li wan kiribin, lê belê dîsa jî tiştekî nerast heye. Di wan de jiyan nîne. Mirovekî mirî, çavên wî hebin jî nabînin, guhên wî hebin jî nabihîzin û pişika wî li cih xwe jî be nikare hilmê bistîne. Dema mirovek bimire em dibêjin ew çû ser dilovaniya xwe an jî ew mir. Belê, lê jiyan çi ye? Ji ku tê?

Mirovan bi demeke dirêj bi vê pirsê ve mijûl bûne. Zanistan lêkolînê li ser organîzmayên cihê kirine û xwestine jiyanê pêk bînin, lê belê van kirinên wan ji tu tiştî re nebûne. Mirov nikare jiyanê bide mêşeke biçûk an jî kêzikekê jî. Jiyan her tim, bona zanistan weke razekî nehatiye çareserkirin û zanîn maye.

We dîtine, dema xweza di biharê de hişyar dibe dibistan çawa diguherin û çîçegan dest bi vekirinê dikin. Ji nava rêya asfalt zîleke lawaz derdikeve û xwe dirêjî tavê dike. Ev çi ye? Ev hêza jiyanê ya mezin, aqil nagihêje û veşartî ye!

Kitêba Pîroz raza zanistan nikarin fambikin têdigehîne. Ji me re dibêje ku jiyan di Xwedê de veşartiye. Yê ku jiyandêr e û jiyanê dide her afirî Xwedê ye. Bêyî Xwedayê ku jiyanê dide, dê dinya bibe goreke bi bêdengiyek mirinî ve hatiye dorpêçkirin.

Xwedê tenê bo rûyêerdê bi dayîna jinayeke derbasdar namîne. Ji yên ku mîna Xwedê û Xelasker baweriyê pê anîne re jiyana abadîn jî dide. Ger hûn dixwazin ji têkçûna abadîn xelas bibin, nêzîkî Xwedê bibin û diyariya Wî ya bêhempa, jiyana abadîn bigirin. Di domahîka xwendina vê pirtûkê de, hûn ê hîn bibin ku, ka bona stendina jiyana abadîn divê mirov bi çi awayî nêzîkî Xwedê bibin.

Niha tu carî ji bîr nekin ku bêyî Xwedê jiyan jî nîne.

1 - Ma gelo kî jiyanê dide mirovan, nebatan û ajalan?

2 – Ma gelo bêyî Xwedê pêkaniya jiyanê heye?

XWEDÊ RONAHÎ YE

"Mizgîna ku me ji Wî bihîstin û niha têdighînin we ev e: Xwedê ronahî ye û di wî de qet tarî tune."
(1.Yûhena 1:5)

"Îsa dîsa bi wan re axifî û got: Ez ronahiya dinê me; kesê ku li pey min were, di tariyê de nameşe û dibe xwediyê ronahiya jiyanê." *(Yûhena 8:12)*

Ronahî çi qasî xweşik e! Bêyî ronahiyê dê jiyan gellekî dijwar bûya. Tarî ne xweş e. Tenê dizekan û kesên ku naxwazin karên wan ji aliyê kesên din bêne dîtin, ji tariyê hez dikin. Ji ber ku Xwedê nexwest mirov di tariyê de bijîn, bona ku rûyêerdê ronî bikin roj û heyvê afirandin. Taybetmendiyek nûwaze ya mîna hêza qewirandina tariyê da ronahiyê.

Kitêba Pîroz dibêje ku Xwedê tenê ne Afirkerê ronahiya têtе dîtin e, di heman demê de Ew bi xwe jî ronahî ye. Di hizûra Xwedê de her tişt zelal, aşkere û diyar e. Hemî raman û daxwazên me yên em ji mirovan vedişêrin, ji Xwedê veşartin bêderfet e.

Xwedê vê rastiyê heta dighîne zarokan jî. Wekî zarokek dibe ku hûn bona tiştê aidî kesekî din e rahêjin hatibin xapandin. Dibe ku we bi dizîka wê rahiştibin. Tiştê ku we kiriye tu kesî nedîtibû û kesî we bi dizîkirinê ve tawanbar nekiribû. Lê belê tê bîra we ku wicdanê we, çawa we bêaram kiribû. Wicdanê we, ji we re digot: "Te tiştekî xelet kir! Dizîkirin ne tiştekî rast e!"

Ev mînak, li ser Xwedê we çawa qanih dike û tiştê ku yê kesekîne rahiştin çi qasî xelet e bi we dide famkirinê, bû! Xwedê bi awayekî di jiyana her kesî de çalak dibe. Dema mirovek tiştekî xelet bike wicdanê wî dê wî bêaram bike. Xwedê ronahî ye û famkariya rastî û xeletiyê bona mirovan pêk tîne.

Sed heyf û mixabîn mirovan ji ronahiyê zêdetir ji tariyê hez dikin (Yûhena 3:19). Kesê gunehkar ji roniyê hez nake, ji ber ku dixwaze tevgerên xwe yên xerab veşêrin. Lê belê Xwedê her tiştî dibîne û bi her tiştî dizane. Rojeke Xwedê, hemî mirovên ji ronahiyê hez nakin daraz bikin tê.

1 – Ma gelo çima navê ronahiyê li Xwedê kirin?

2 – Ronahî çawa digihêje dilê mirovan û li wê çi dike?

XWEDÊ DARAZDAREKE BIDAD E

"Xwedê darazdareke bidad e, Xwedayek wisa ku her roj hêrsê diweşîne." *(Zebûr 7:11)*

"Dê Xwedê her karî, her tiştê veşartî daraz bike. Dixwaze qenc, dixwaze xerab be." *(Waiz 12:14)*

Di vê dinya ku em tê de dijîn de her roj gellek sûc têne kirin; dizî, qesasî, tundî û tiştên mîna vana têne kirin. Bona parastina pergalê û mirovên bêsûc, yên tawandar bi navgîniya zagonê têne darazkirin û bicezakirin. Dibe ku darazdar di daraziyên xwe de xeletiyê bikin û yê bêsûc biceza bikin û yê bisûc bimaf derxînin. Yekcaran dibe ku bi zanînî jî daraziya xelet bidin.

Lê belê Xwedê Darazdareke bidad e. Pîroz û bêguneh e. Darazdarên li rûyêerdê daraziya çewt bidin jî, Xwedê her tim bi awayekî rast daraziyê dike. Tu carî tiştekî neheq nake. Zagonek nivîskî, ya hemî daraziyên Xwedê tê de nivîsandiye heye û ew jî Kitêba Pîroz e. Dê Xwedê bi navgîniya vê zagonê hemî mirovan daraz bike û dê her yek li gora karên ku kirine bêne xelatdarkirin.

Dibe ku hûn ji ber ku tu carî diziyê nekirine an jî kesekî nekuştine, wisa difikirin ku dê bandora zagona Xwedê li ser we nebin. Lê belê li ber Xwedê hêrs, tevgerên bêxîretî an jî bêîtaetiyek biçûk ya mîna derewê jî sûc e. Kitêba Pîroz ji me re dibêje ku dê Xwedê biçûk, mezin, qenc, xerab, veşartî an jî aşkere her karî daraz bike. Dê Xwedê bitûndî û bi awayekî bidad darazkariyê bike.

Xwedê, bona ku tu kes ji ber sûcên xwe nemirin, fersenda tobekirinê daye her kesî. Xwedê dixwaze her kes jiyaneke rast bajo û ger wisa bikin, dê bikaribin xelatekê bistînin. Ger hûn di daraziyê de pakbûnê û stendina xelatekê bixwazin, divê hûn bi zagonên Xwedê bizanibin û li gora wan bijîn.

1 – Gelo çima pêdiviya me ji darazdarekî re heye?

2 – Gelo em ê bi çi awayî ji daraziya Xwedê birevin?

XWEDÊ HEZKIRIN E

"Û em bi hezkirina Xwedê, ya bona me ye dizanin û em bi wî bawer bûn. Xwedê hezkirin e û yê ku di hezkirinê de bimîne, di Xwedê de dimîne û Xwedê di wî de dimîne." *(1. Yûhena 4:16)*

"Hezkirina Xwedê bi vêya ji me re hate nişan dayîn, bona ku em bi navgîniya wî bijîn, Xwedê Lawê xwe yê tekane şand dinê. Hezkirin di vê de ye, ne ku me ji Xwedê ve hez kirin, lê wî ji me hezkir û Lawê xwe ji bo kefareta gunehên me şand." *(1. Yûhena 4:9, 10)*

Xwedê Darazdareke bidad e û di heman demê de Xwedê hezkirin e. Ev wesfan di Wî de bi awayekî gellekî qenc yekbûyîne! Xwedê ji me hez dike û naxwaze me bi ceza bike. Xwedê, bona ku di darazkirinê de em ne cezayekê lê diyariyekê bistînin, bona me gellek tiştî pêk anîne.

Ma gelo em ji ku dizanin Xwedê ji me hez dike? Pêşiyê, Kitêba Pîroz vê yekê ji me re dibêje. Ya duyem, Xwedê hezkirina xwe bi tevgera xwe nîşan dide û ev jî bona her kesî bi awayekî aşkereyî xuya dibe.

Xwedê him ji yên qenciyê dikin û him jî ji yên xerabiyê dikin, yanê ji her kesî hez dike. Sedema her roj, roj diçe ava, hezkirina Xwedê ya bona me ye. Xwedê jiyanê daye her kesî, ji aliyê din ev derbirîna hezkirina Wî ye. Lê belê tiştê gellekî birûmet û mezin ya ku Xwedê bona her kesî kiriye, li dijî gunehê Lawê Xwe Îsa Mesîh, mîna fidyeyê dayîna Wî ye. Ev hezkirina Wî ya herî mezin e û bi gotinan nayê terîfkirin.

Hezkirina dayikekê, li rûyêerde mîna hezkirineke herî seretatir tête dîtin. Gelo ji ber çi? Dayikek bi çavekî birehm li zarokên xwe dinêre, perwerdeyê dide wan û baldirêjiyê li ber tewşikiyên wanî zarokantiyê dike. Lê li hember vê yekê, hezkirina dayikekê bi awayekî gellek kêm bi hezkirina Xwedê re tête qiyas kirin. Yekcaran dayikek zarokê xwe red dike û wî bi qedera wî ve diterikîne. Dê Xwedê tu carî zarokê xwe neterikîne. Hezkirina Wî ya ji me re heye, ji hezkirina dayikekê gellekî mezintir e.

Terîfkirina hezkirina Xwedê bêderfet e, lê melê mirov dikare hezkirina Xwedê bijî. Xwedê ji we hez dike! Xwedê dixwaze hûn bi hemiya dilê xwe ji Wî hezbikin û heta abadîniyê bi Wî re bijîn.

1 – Xwedê hezkirina xwe çawa nîşan daye?

WEDÊ ABADÎN E

"Rojên min mîna siya dirêj dibe di windabûnê de ne… Lê belê tu heta abadîniyê di texta xwe de rûniştî yî ya XUDAN." *(Zebûr 102:11, 12)*

"Ma tu pê nizanî, te nebihîst? Xwedayê Abadîn XUDAN, Afirkerê hemiya dinê, ne diweste ne lawaz dibe. Têgihîştina zanîna Wî bêderfet e." *(Îşaya 40:28)*

Xwedê dixwaze ku hûn bi hemiya dilên xwe ji Wî hezbikin. Hûn ê bi gotina: "Heta abadîniyê?" Belê! bêjin.

Ji roja ku hûn welidîne re dibêjin rojbûyîna we û destpêka jiyana we tête hesibandin. Destpêkek hemî mirovan, ajalan, civîkan û nebatan û heta rûyêerdê, stêrkan û rojê jî bûye. Tenê destpêka Xwedê nîne. Xwedê abadîn e.

Wekî mînakekê cergeyekê bifikirin. Hûn nikarin fambikin ku cergeyek ji ku destpê dike û di ku diqede. Bi heman awayî destpêk û dawiya Xwedê jî nîne. Xwedê her tim hebû û dê her tim hebe. Tu kesî Wî neafirandiye. Rojbûyîneke Wî nîne û Ew ê tu carî nemire. Xwedê bêyî encamê dijî, di tûmiya abadîniyê de dijî! Têgihîştina hişê mirov, bona vê mijarê karekî dijwar e. Divê em bi vê yekê bawer bibin.

We berê xwendibûn ku Xwedê Afirkerê ezmanan û rûyêerdê yî. Xwedê yekane yê ku jiyan û ronahiya hemiya tariyê tune dike yî. Ew darazdareke bidad e û abadîn e. Xwedê hezkirin e. Di hezkirina Wî ya bêpî-

van de bona ku heta abadîniyê bi Wî re bijîn, dixwaze her kesî digel xwe bigire buhuşta xwe. Bona ku biçin buhuştê û heta abadîniyê li wê bi Wî re bijîn divê mirov li ber Xwedê tobe bike û bi Wî re mîna Xudan û Xelaskerê xwe dua bikin.

Di domahîka xwendinê de hûn ê bibînin ku ev kar çawa tête kirin

1 – Wateya peyva "abadîn" çi ye?

2 – Bona bi Xwedê re heta abadîniyê bijîn divê em çi bikin?

GUNEH ÇI YE?

"Her xerabî guneh e..." *(1.Yûhena 5:17)*

"Her yê ku guneh dike, êrîşî zagonê dike û guneh, êrîşkirina zagonê ye." *(1. Yûhena 3:4)*

Xwedê rûyêerdê afirand û rûyêerdê nûwaze bû. Di behr û çeman de şepalan bi bêdengiyê li peravê dixistin. Hewa bi bêhna çîçegan ya xweş ve tijî bû. Dar bi fêkiyan ve tijî bûn û dengê civîkan şên bûn. Adem û Hawa bi awayekî bextewarî li Bexça Adenê dijiyan. Xwedê bona Adem û Hawa bi awayekî azad bi Wî re di nava pardariyê de bin û aramiya hebûna Wî bijîn her tiştî pêk anîbûn. Lê belê…

Rojekê tiştekî tirsehêz bû! Adem û Hawa guneh kirin.

Xwedê pîroz e û gunehê jî bêceza bernade. Ji ber vê yekê pêdivî bû ku Adem û Hawa ji wê buhuşta nûwaze bêne qewirandin. Ji ber ku Adem bona rêvebiriya rûyêerdê bike li vê hatibû bicih kirin, sûcê ku kiribû, xerabiyê anî rûyêerdê. Xwedê ji Adem re: "Ax ji ber te hate naletîkirin" got û ji wê demê wê de di zeviyan de stirî mezin bûn û ajotina axê gellekî dijwar bû. Kurman dar û fêkiyan mehf kirin û gellekên ajalan bi awayekî hov derketin holê. Mirovan dest bi her cûreyên xerabiyê kirin, nexweş ketin û dest bi mirinê kirin.

Gelo hemiyên vana ji ber çi çêbûn? Ma çima rûyêerdê û mirov ew qasî guherîn? Sedema vêya gunehkirina mirov bû. Guneh mirov ji Xwedê bidûr xistin û wan anî awayekî neşad bin. Guneh, xerabî, çavnebarî, têkçûn, êş û mirinê anî. Guneh bextewariya mirovan tune dike û tevliheviyê tîne hemiya dinê.

1 – Wê gavê guneh çi ye?

GUNEH LI DIJÎ XWEDÊ BÊÎTAETÎ YE

1 – Dê ji bilî min xwedayê te nebe.
2 – Tuyê ji xwe re seneman çêneke.
3 – Tuyê belasedem navê Xwedayê xwe XUDAN negre devê xwe.
4 – Roja Şabatê pîroz bihesibîne û di bîra xwe de bîne.
5 – Rêz û hurmetê nîşanî dê û bavê xwe bide.
6 – Tuyê nekuje.
7 – Tuyê zinê neke.
8 – Tuyê nedize.
9 – Tuyê li dijî cîranê xwe bi derewîn şahidiyê neke.
10 – Tuyê çav bernede tu tiştê cîranê xwe.

(2. Mûsa 20:1-17)

"Ji ber, çawa ku bi sedema bêîtaetîkirina mirovekî gellek kes gunehkar hatibin kirin..." *(Romiyan 5:19)*

Xwedê Adem û Hawa danîn buhuşteke nûwaze. Ji bilî darê qencî û xerabiyê zanînê, destûra fêkiyên hemî

daran dan wan. Xwedê di derbarê, ger fêkiyê vê darê bixwe de, dê bimire, Adem hişyar kir. Ger Adem û Hawa Xwedê guhdarîbikirana dê şadiya wan bidomiya. Lê belê trajediyek pêk hat!

Îblisê ku xerab e, bi navgîniya herî fenekê ajalên hov, mar ve bi Hawa re axifî. Îblis gumanan xistin hişê Hawa û ew jî ka hela birastî jî Xwedê gotinên xwe qestî gotiye an na, dest bi pirsiyariyê kir. Di encamê de fêkiya qedexe xwar û li bêîtaetiyê li gotina Xwedê kir. Hawa fêkiyê rahişt, wê xwar û da mêrê xwe jî.

Adem û Hawa bi gotinên ku Îblis bi navgîniya mar ve gotine bawer bûn, qedexekirina Xwedê tune hesibandin û li dijî Wî bêîtaetiyê kirin. Ev guneha pêşîn Adem û Hawa ji Xwedê cuda kirin û Xwedê jî ji ber bêîtaetiya wan, wan ji buhuşta ku lê dijîn qewirandin.

Her ku mirov li rûyêerdê zêde dibûn Xwedê zagona xwe ya ji deh emrî an jî rêzikî pêk hatiye dan wan. Xwedê, ka dê mirov çawa bitûmî jê re îtaet bikin ji wan re gotin. Ev deh emir li pelê kêlekê nivîsandîne. Li ser vana bifikirin. Gelo hûn îtaetê li destûrên Xwedê dikin an na?

Xwedê emre: "Rêz û hurmetê ji dê û bavê xwe re bikin" dabû. Ger hûn hurmetê ji dê û bavê xwe re nekin, hûn gunehê dikin.

Xwedê gotibû: "Tuyê nedize!" Ger hûn tiştên ne aidî we ne radihêjin, hûn li dijî emrê Xwedê gunehê dikin.

Em li emrekî din yê Xwedê binêrin: "Tuyê li dijî cîranê xwe bi derewîn şahidiyê neke." Yanê bi gotinên derewîn li dijî cîranên xwe neaxifin.

1 – Gelo Adem û Hawa kîjan gunehê kirin?

2 – Hûn bi kîjan emirê Xwedê dizanin?

GUNEH NEXWEŞIYEK MIRINÎ YA RAKENDÎ YE

"Bo vê yekê, çawa ku guneh bi navgîniya mirovekî û mirin jî bi navgîniya gunehê ve ketibe dinê; bi vî awayî mirin jî derbasî hemû mirovan bû; ji ber ku hemûyan guneh kirin." *(Romiyan 5:12)*

Ji ber ku Adem û Hawa guneh kiribûn, hemî mirovan mîna gunehkaran welidîne. Mirovan bi xapandina hev, bi kerihandina hev û bi kuştina hev her ku çû ji Xwedê dûr ketin.

Guneh ji dê û bavan derbasî zarokan bûye, ev rewş di roja me de jî didome. Zarokek biçûk temaşe bikin. Çawa ku hê nikare biaxife û bimeşe jî, dema tiştê ku bixwaze nedin wî, sor dibe û diqîre. Divê dê û bavê wî rabûn û rûniştinê û bi kevçiyê xwarinê hînî zarok bike.

Lê belê pêdivî nîne ku tu kes derxistina pirsgirêkan, şerkirinê û derewgotinê hînî wî bikin. Ji xwe ev dikare vana bikin!

Gelo we tu carî jiyanek bêyî gotina derewan, çavnebariyê an jî bêyî dizîkirinê ceribandin? Ger we vêya ceribandibe bi dibêtiyeke mezin we bêderfetiya bêguneh jiyînê dîtine. Ma ji ber çi ye hûn pê dizanin? Ji ber ku em gunehkar in. Bi zebûniya gunehkirinê em hatine vê dinê. Karên xerab ên ku em dikin, ji dilên meyî gemarî pêk tên. Vê xwezaya gunehkar ya me mêras girtine, bi awayekî bêxelasî me dibe mirinê. Ji ruhên me re dibe çavkaniyek mezin ya lêdanê. Xweşî, aramî û şabûna me û fersenda me ya em biçin buhuştê û heta abadîniyê bi Xwedê re bijîn ji dest me digire.

Gelo em ê çawa ji vê nexweşiya "guneh" ê ya tirsehêz xelas bibin? Ma pêkaniya ji gunehê xelasbûnê heye?

1 – Gelo çima hemî mirovan bi gunehkarî welidîne?

2 – Gelo hûn di jiyana xwe de qet tu gunehê dibînin?

GUNEH BAREK E

"Ji ber ku sûcên min qama min derbas kirin. Mîna barek nayê kêşandin li pişta min giran bûn."

(Zebûr 38:4)

Xerabî xwedî zerengiyek bi awayekî neyê bawerkirin zêdebûnê yî. Gunehek mirov dibe guneheke din.

Mînak, dema zarokantiya xwe mihaqeq di derbarê, bêyî destûr ji tûrika dayika xwe pere nestîn de hûn ha-

tine îkaz kirin. Lê belê tiştekî dê û bavê we destûrê nadin hûn bistînin di dilên we de bû, ji ber vê yekê we bêyî destûr bi dizîka pere rahiştibûn. Dema dê û bavê we, pirsa, gelo te ji tûrika dayika xwe pere rahiştiye, pirsîn, we jî: "Min nestendiye!" gotibû. Dizî, we pêşiyê biribû bêîtaetiya stendina tiştê ku bo wê destûr nîne û paşê jî biribû derewê. Di derbek din ya di derbarê dizî nekirinê de hûn hatibûn îkazkirin de, dibe ku we li dêvila çentekê dayika xwe, ji bêrîka yekî din ve pereyek hîn jî zêde bidizîna.

Mirovên ji her demê ne, xwestine ku pirsgirêka gunehê çareser bikin. Xwestine ku ji derewçînan, dizekan, tawandaran û her cûreyên mirovên xerab xelas bibin lê belê di derbarê pirsgirêka gunehê ji holê rakirinê da, tu tişt bikêr nehatiye. Di roja me de ji hezar salî berê kêmtir guneh nîne. Di dinya roja me de xerabî hê jî hatiye rewşeke mezin.

Guneh mîna kevirên mirov bide hev û di cuhera xwe ya pişt de bikişînin e. Her gunehê ku tê kirin, mîna kevirekî bi cuherê ve vekirin e. Heftî, meh û salan derbas dibin û gunehê mirov her ku diçin girantir dibin. Barê guneha gellekî giran e mirov neşad dike, lê belê nikare ji barê xwe xelas bibe û azad be. Ev mirov her biçe ku bila biçe, her çi bike bila bike, barê gunehê her tim pê re ye, tahdê lê dike û her ku diçe zêde dibe.

1 – Guneh xwedî zerengiyek çawa ye?

2 – Çima guneh mîna barekî giran têtе şibandin?

GUNEH SUXREKAREKE TUND E

"Her kesê ku gunehê bike, dîlê gunehê yî."
(Yûhena 8:34)

"Mîna dîlên îtaetê, hûn ê xwe bidin destê kê, ma qey hûn nizanin ku hûn dîlên wî kesê ku îtaetê jê re dikin in? Hûn an dîlê gunehên dibe mirinê, an jî dîlê îtaetê ku dibe rastiyê ne." *(Romiyan 6:16)*

Guneh tu carî şadbûnek rasteqîn nade mirovan. Di destpêkê de dibe ku guneh cazib û bêzerar xuya bibe, lê belê her tim di encamê de guneh, gellek keserî, tahlî û heta lêdanê pêktîne. Soza we ya we xwe bi xwe bi gotina "êdî bes e… Ez ê êdî gunehê nekim" daye jî bi kêr nayê. Dema mirovek bibîne guneh çawa çalak e û bixwaze jiyana xwe biguherîne û xwe ji gunehê xelas bike, dê bibîne ku nikare dev ji gunehê berde. Guneh suxrekareke gellekî tund e.

Guneh, di dilê mirov de cihê aidî Xwedê ye digire û mirov tîne rewşa dîleke reben û kotekxwarî. Gelo hûn xwe di rewşa kirina tiştekî naxwazin bikin de dibînin? Hûn naxwazin tu kesî bixapînin, lê belê zimanên we derewan dikin û guhertina kirinên we bêderfet xuya dibin. Hûn naxwazin hêrs bibin lê belê gellek carî hûn bi zarokên xwe, hevsera xwe an jî mirovên ku hûn bi wan re dixebitin re, ji ber tiştên biçûk dipekin. Hûn biryara nekişandina cixarê û nekirina kufiran didin, lê belê di navbera demek kurt de hûn ji vê biryara xwe vedigerin. Hûn dizanin ev gellek tiştekî xelet e, lê belê ji destê we tu tişt nayê. Wekî yek we bona ku hûn heqa-

retê li kesên din bikin, bi bêaqilî biaxifin, hêrs bibin û ji her kesî û her tiştî re çêran bikin tahn dide. Sedema vê yekê, di bin rêvebiriya gunehê de bûyîna we ye.

Guneh suxrekareke gellekî tund e û tu kes nikare xwe ji dîlitiya Gunehê xelas bike. Guneh rêvebiriyê li jiyana mirovekî dike û tiştên li dijî daxwazên Xwedê ne bi wî didin kirin.

1 – Gelo sedema gunehkirina me çi ye?

2 – Gelo mirovek dikare tena serê xwe dev ji gunehan berde?

GUNEH TAWANBARKERÊ ME YE

"Ji ber ku me gellek carî li ber te serî hildan, gunehên me li dijî me şahidiyê dikin, dijrabûnên me tim digel me ne. Em sûcên xwe qebûl dikin." *(Îşaya 59:12)*

Afirker mirovahiyê wisa afirandiye ku, dema em tiştekî xelet dikin, xwe tawandar hês dikin. Hişmendiya sûcê ruhê me bi tahlbûn û tirsê ve tijî dikin. Mirovan dike bixîne depresyonê jî. Ger tiştê ku hatiye kirin êdî qandî neyê serrastkirin xera bûbe, hesta tawandariyê hê jî xemgîrkirî dibe.

Mînak, ji hevsera xwe re dilsoznemabûn tiştekî xelet e lê belê dibe ku hûn dema hatin xapandin, lawaz ketibin. Bona ku hûn vê binketinê ji ji hişên xwe derxînin

an jî gunehên xwe mafdar xuya bikin her çi qasî hewl bidine jî hûn ê jana sûcdariyê bikêşînin û dê wicdanê we bi awayekî giran we tawandar bikin. Bona ku ji cezaya abadîn xelas bibin, divê hûn gunehê mxwe yê zinê qebûl bikin û li ber Xwedê tobe bikin.

Guneh me her tim ji Xwedê ve cuda dikî û em nikarin ji berpirsiyariya tiştê ku ji berê ve hatiye kirin birevin. Li gora Zagona Xwedê divê guneh bête bicezakirin û cezaya gunehê jî mirin e. Li ber ber Xwedê her tişt aşkere ye û Xwedê bi her tiştên di derbarê me de ne dizanin. Em nikarin Wî bixapînin.

Guneh di navbera demê de tune nabe. Em dikarin wîjdanên xwe aş bikin û gunehan jibîr bikin lê belê Xwedê, Roja Daraziyê dê têgihandina her tiştên ku me kirine ji me bixwazin. Dê gunehên me li wê me di derbarê li dijî Xwedê sekinandinê me tawanbar bikin. Cezaya gunehkaran ji berê ve hatiye diyarkirin. Xwedê gotibû ku cezaya gunehê mirin yanî têkçûna abadîn e.

1 – Dê di roja daraziyê de gunehên we çi bi we bikin?

2 – Bona gunehên me divê cezayeke çawa hebe?

ÎSA MESÎH KÎ YE?

"Ew jî bi tirsekî mezin tirsiyan û ji hev û din re gotin: Ma ev kî ye ku, him bahoz û him jî gol jê re îtaet dikin?." *(Marqos 4:41)*

"Û yên ku bi wî re li sifrê rûniştibûn, dest pê kirin û ji xwe re gotin: Gelo ev kî ye ku, li gunehan jî dibexşîne?" *(Lûqa 7:49)*

Nêzîkî du hezar sal berê li rûyêerdê mirovekî gellekî dererêzê yî jiya. Navê Wî Îsa Mesîh bû. Ew di heman demê de him mirov û him jî Xwedê bû. Çawa ku di navberê de bist sedsal buhurîne, lê navê Wî di hemiya gerdûnê de têtе zanîn û di roja me de gellek mirov bi Wî diperistin.

Bûyîna Mesîh bû destpêka demeke nû. Îs Mesîh miroveke nûwaze bû. Tu kes mîma Wî newelidîbû; tu kes mîna Wî nejiyabû; tu kes mîna ku Ew miriye nemirîbû û tu kes mîna Wî ji mirinê nevejiyabû.

Îsayê mezin û xurt e, di heman demê de mirovekî gellekî sade û bêxeml bû. Zarokan, ciwan û kalan bi hêsanî pê re peywendiyê datanîn. Ajaweyan bona ku Îsa bibînin û gotinên Wî guhdarî bikin, Wî şopandin.

Di Îsa Mesîh de hêzeke mirov nikarin lê xwedî bin hebû. Îsa tenê bi gotinekê dikarîbû şepelên behrê aş bike. Bi pênc nanî û du masiyî ji pênc hezarî zêdetir kesî têr kiribûn. Nexweşan baş kiribûn, gellek mûcîze-

tan pêkanîbûn, ji mirovan re bona ku Xwedê dilxweş bikin jiyînê dabû fêrkirin û li gunehan bexşandibû. Mirovan her ku Mesîh temaşe dikirin di nava şaşmatiyê de diman û pirsa: "Ev zilama kî ye ku ba û behr jî serî li ber Wî datînin? Ev zilamê li gunehan dibexşîne kî ye?" pirsîbûn.

1 – Îsa Mesîh kî ye?

ÎSA MESÎH LAWÊ XWEDÊ YE

"Ji ber ku Xwedê ev qas pirr ji dinê hez kir ku, Lawê xwe yê tekane da; da ku, bila tu kes, ji yên bawerî bi wî bîne helaq nebe, lê bila jiyana wî ya abadîn hebe."
(Yûhena 3:16)

Hêz û zanyarî û rayedariya Îsa Mesîh serxweza bû ji ber ku Ew Xwedayê abadîn bû. Îsa Mesîhê Lawê Xwedê, di nava dîroka mirovahiyê de tenê carekê di bedena mirov de hatibû rûyêerdê.

Hatina Îsa Mesîh ne surprîz bû. Xwedê, beriya salên dirêj welidandina Îsa Mesîh gîhandibû mirovan.

Wekî we pêşiyê jî xwendin, guneh mirov ji Xwedê cuda kir. Her ku mirov li rûyêerdê zêdebûn û gunehkirinê domandin, Afirker vê rewşê temaşe kir. Dît ku ew ji ber gunehên xwe êş û tengasiyê dikişînin. Pîrozbûna Xwedê derfetê nedidat ku Ew bi gunehkaran re bibe pardar. Di navbera Xwedayek pîroz û mi-

rovek gunehkar de kendalek derbasbûna wê bêderfet e heye.

Lê belê Xwedê hê ji mirovan hezdike û dixwest ku wan xelas bike. Bona yekî gunehkar bê rewşa pîroz û nêzîkî Xwedê be, di vê kendala cihêtiyê de damezirandina pirekê pêk anî.

Sedema pêkhatina mûcîzetek, mîna Xwedê Lawê xweyî yekane bişîne dinê, herî mezin û nayê dubarekirin jî ev e. Îsa Mesîh ji Bavê xwe ra: "Ez bona daxwaziya te bikim hatim ya Xwedê" gotibû. Bona mirovê gunehkar bi Xwedê re aşt bike û wî ji mirina abadîn xelas bike, bilindahiya xwe ya ezmanî danîbû aliyekî û hatibû rûyêerdê.

1 – Gelo Xwedê ji ber çi Lawê xwe şand rûyêerdê?

ÎSA MESÎH LAWÊ MIROV E

"Û Îsa ji wî re got: Qulên rêviyan hene û hêlînên teyrên ezmanê hene, lê belê cîhekî Lawê Mirov nîne ku ew serê xwe lê bisipêre." *(Meta 8:20)*

"Ji ber, çawa ku di Bav de jiyan heye, bi vî awayî wî vê rayedariyê da Law jî. Û rayedariya darazî kirinê jî da wî; ji ber ku ew Lawê Mirov e."

(Yûhena 5:26,27)

Îsa Mesîh mîna Qiralekî ezmanî, bi nîşandana bilindahî û mezinahiya Xwedê nehat rûyê erdê. Îsa, li ba-

jarê Beytlehemê ji Meryema Qîzîn welidîbû. Wekî her kesên li rûyêerdê ne bavekî Wî tunebû. Welidandiya di encama mûcîzetekê bûbû. Îsa Mesîh Lawê Xwedê bû û dema li rûyêerdê dijiya di heman demî de navê Lawêmirov lêkiribûn. Îsa di heman demî de him Xwedê û him jî mirov bû.

Lawê Xwedê jiyana xwe li rûyêerdê di nava dilnizmiyek mezin de jiya. Îsa, ji ber ku di maleke asayî de jê re cih nehatibû dîtin, di axurekê de hatibû dinê. Dema Îsa mezin bû, cihekî tunebû ku serê xwe lê deyne. Ji mirovan re bi têgîhandina rastiya Xwedê gund bi gund, bajar bi bajar geriya. Hêza xwe ya xwedanî, bona jiyana xwe hêsantir bike bikar neanî. Îsa jî mîna hemî mirovan baldrêjiyê li ber tîbûn, birçîbûn, serma û germê kirin. Westiya, ji hal ket, giriya û êşê kişand.

Her çi qas Îblis bona Wî bixapîne gellek hewl dabe jî Îsa Mesîh tu carî gunehê nekir. Gellek mirovan Mesîh fam nekirin. Bi Wî keniyan û gellek carî xwestin ku Wî birecimînin û bikujin. Lê belê Îsa ji wan re qala hezkirina Xwedê kir û bona tobe bikin bangî wan kirin.

Îsa Mesîh yekî pîroz û Xwedê ji her alî ve dilxweş dike bû.

1 – Gelo ji ber çi navê Lawêmirov didin Îsa?

ÎSA MESÎH BERXÊ XWEDÊ YE

"A vay Berxê Xwedê, yê gunehê dinê ji holê radike!"
(Yûhena 1:29)

Xwedê di demên gellekî kevnare de ji mirovan ve xwestibû ku bila bona gunehên xwe qurban bikin, berxekê bînin. Divê berx bitûmî bêqisûr be; kor, kulek an jî nexweş bûya nedibû. Ev berxika, nîşana Îsa Mesîhê ku Berxê bêxeletî û bêguneh e, bû.

Divê guneh bi navgîniya dadiya Xwedê bi mirinê ve bihata bicezakirin. Kitêba Pîroz; "Bêyî xwînrijandinê bexşandin nabe" dibêje (Îbraniyan 9:22). Xwedayê me yê bi hezkirinê ve tijî, ji ber ku mirina gunehkaran nedixwest, destûrê da ku gunehkaran berxekî bêguneh mîna pêşkêşiyê bînin. Berx hate jêkirin û li ser pêşkêşîgehê hate şewitandin û bi vî awayî li dêvila kesê gunehkar mir. Guneh bi ser berxê bêguneh hate barkirin û kesên qurbanê pêşkêş kirine paqij bûn.

Ji ber ku Îsa Mesîh gunehê her kesî hilgirt ser xwe û bona hemî mirovan mir, navê Berxê Xwedê li Wî kirin. Kesê bêguneh bona tawandaran miribû. Ev, mûcîzetek mezin ya hezkirin û dilovaniya Xwedê bû. Ji mirina Îsa vir de, êdî pêdivî nîne ku gunehkaran bona gunehên xwe berxekî mîna pêşkêşiyê bînin. Qurbanê xwîna Îsa, bona hemî birovên di her demê de dijîn bes e.

Îsa Mesîhê ku Berxê Xwedê yî, bi mirina xwe hemî gunehên me ji holê rakir. Xwîna Wî, jiyana kesê ku bi

qurbana Wî ya xelas dike ve baweriyê bînin, ji gunehê ve xelas dike.

1 – Gelo çima navê Berxê Xwedê dane Îsa Mesîh?

2 – Qurbana ku Îsa Mesîh pêşkêş kiriye bona me tê çi wateyê?

ÎSA MESÎH VEJÎN Û JIYAN E

"Îsa Mesîhê ku miriye û di ser de vejiyaye…!"
(Romiyan 8:34)

"Îsa ji wê re got: Vejîn û jiyan ez im; yê ku baweriyê bi min bîne, ew bimire jî dê dîsa bijî." *(Yûhena 11:25)*

Berxê Xwedê Îsa Mesîhê ku pak û pîroz e bi xaçê ve hatibû şidandin. Piştî mirina Wî bedena Wî ji xaçê ve daxistibûn û li gorekê dirêjkiribûn. Kevirekî mezin bi devê gorê ve gindirandibûn. Serokkahînan ji tirsa dê şagirtên Îsa werin û cendekê Wî bidizin, kevir mohrkiribûn û notirvanên wê biparêzin peywirdar kiribûn.

Merivên Îsa, hevalên Wî û şagirtên Wî di nava xemek giran de, du rojê gellekî dijwar bû jiyan. Meryema Mejdelanî û du jinê wekî din, sibeha roja sêyem serê sibê zû, bona kevneşopiya rojhilatê, kevneşopa biharatên şêrîn bi bedena mirî ve bidin çûn gorê.

Lê belê mûcîzetek bêhempa pêkhatibû. Xwedê Îsa ji mirinê vejinandibû! Mirin nikarîbû yê bêguneh di dest xwe de bigire. Jinikan dîtin ku kevir gindiriye û di nava gorê de milyaketek rûniştiye. Milyaket ji wan re: "Şaş nebin!" got. "Hûn li Îsayê Nisretî yê ku bi xaçê ve hatibû şidandin digerin. Ew vejiya, ne li vê ye. A vay, cihê ku Wî lê dirêjkirine!" got (Marqos 16:6).

Îsa Mesîh vejiyaye! Îsa mirinê bindest kiriye û niha jî gunehkarên ji aliyê ruh ve mirî ne divejîne û jiyana abadîn dide wan. Ev rewş, dema gunehkarek vegere Xwedê û ji gunehên xwe tobe bike, pêk tê. Xwîna Îsa Mesîh, ruhê Wî ji hemî xerabiyan paqij dike û li gunehê vî kesî tête bexşandin. Ev kes, bi navgîniya baweriyê Îsa di dilê xwe de qebûl dike û ji aliyê ruh ve tê awayeke zindî.

We pêşiyê de xwendin ku hemî mirov gunehkar in. Hemî mirov ji aliyê ruh ve, li hemberî Xwedê mirî ne û pêdiviya wan ji vejinandinê re heye. Hûn jî di nava vê komê de ne. Ger hûn vê yekê bixwazin, dê Îsa Mesîh bikaribe jiyana abadîn bide we.

1 – Gelo sê rojê li pêy binaxkirina Îsa çi bû?

2 – Vejîna Îsa Mesîh bona we tê çi wateyê?

ÎSA MESÎH XELASKERÊ YEKANE YE

"Tuyê navê ÎSA lêbike. Ji ber ku dê Ew gelê xwe ji gunehên wan xelas bike." *(Meta 1:21)*

"Wekî din di kesekî de xelasî nîne. Di bin vî ezmanî da, navekî wekî din, yê ji me re hatiye bexşandin, bikaribe me xelas bikin nîne." *(Karên Şagirtan 4:12)*

Kitêba Pîroz dibêje ku di gerdûnê de ji bilî Îsa Mesîh tu kes nîne ku mirovan ji gunehên wan ve xelas bikin. Îsa Mesîh yekane yê Xelaskerê Dinê ye. Îsa navekî Îbranî ye û wateya wê "Xudan Xelas Dike" an jî "Xelasker" e.

Em û hemî mirovan, di nava gunehên xwe de dimirin. Guneh heta hebûna meyî hundirîn ve çûye û jiyanê tune kiriye. Me hemiyan biriye mirineke abadîn ya em nikarin jê birevin. Li rûyê erdê tu kes nîne ku me ji vê dahatûya bitoqîn ve xelas bike. Bona gunehkaran hew mirovek bêguneh, yê tu gunehên Wî nînin dikarîbû bimiriya. Li rûyêerdê mirovekî wisa tunebû. Xwedê di dilovaniya xwe ya mezin de Lawê xwe bona ku ji gunehkaran re bibe qurban da.

Îsa Mesîhê pîroz û bêguneh e, bona gunehên me û sûcên me xwîna xwe ya bêguneh da rijandin. Berdêla xelasiya me bi canê xwe da.

Îsa Mesîh îroj hê jî çalak e. Xwîna Îsa Mesîh ya li Golgotayê hate rijandin, xwediyê hêza îroj jî mirovan ji bin zexta gunehê azad bikin e. Li ber Xwedê ruh û jiyana tawandar paqij dike. Gunehkareke hê berê rojekê bê-

guneh jî nebuhurandiye, tê awayeke pîroz! Bi navgîniya hêza qurbana ku Mesîh pêşkêş kiriye ji hînbûnên neqenc û dîlitiya gunehê ve azad dibe. Jiyana wî ji binê ve guheriye! Tenê Îsa di hêza pêkanîna mûcîzetek wisa de yî! Îsa Xelaskerê yekane yê dinê ye, ji ber ku tenê Ew bona gunehên mirovahiyê miriye.

1 – Wateya navê "Îsa" çi ye?

2 – Ma gelo bo çi ji bilî Îsa tu kes nikare mirovan ji gunehên wan ve xelas bikin?

ÎSA MESÎH DI NAVA XWEDÊ Û ME DE NAVBEYNKARÊ YEKANE YE

"Ji ber ku tenê Xwedayek û di nava Xwedê û mirovan de navbeynkarek heye. Ew jî… …Mesîh Îsa ye."

(Tîmotêyos 2:5)

Gunehê mirov û pîrozbûna Xwedê, ne tiştên hevaheng in. Kitêba Pîroz ji me re dibêje ku dema mirov Xwedê bibîne, nikare jiyana xwe bidomîne. (2.Mûsa 33:20). Sedema vêya pîrozbûna Xwedê û gunehkarbûna mirov e. Çawa ku wisa ye, Xwedê di hezkirina xwe ya bêtixûb de rêyekê pêk aniye ku mirov nêzîkî Wî bibe. Îsa Mesîh di navbeyna Xwedê û mirov de bû navbeynkarek. Îsa bi mirin û vejîna xwe mirovan bi Xwedê re aşt kirin.

Îsa piştî ku tiştên li rûyêerdê divê bikirina anîn cih vegeriya buhuştê. Di çil roja piştî vejîna xwe de tevî şa-

girtên xwe çû Çiyayê Zeytûnê. Îsa li vê destên xwe ber ve ezman ve rakirin û şagirtên xwe pîroz kirin. Dema pîrozkirina şagirtên xwe qedand bi ezmanan ve hilkişiya. Şagirtan hilkişandina Îsa, heta ku ewrek hat û Wî ji ber çavên wan bi dûr ve xist, temaşe kirin. Şagirtan dema li wê sekinîbûn û ezmanan temaşe dikirin, du milyaket li cem wan xuya bûn. Gotin ku Îsayê bi ezmanan ve hilkişiyayî dê dîsa vegere rûyê erdê. Dema Îsa vegere rûyêerdê dê hemî mirovên ji Wî re dilsoz mane, bona ku bi Wî re bin bigire buhuştê.

Îsa, yê navbenkarê Bavê xweyî ezmanan, mîna kesê bona me di duayê de navbeynkariyê dike û parêzgerê me vegeriyaye û heta îro jî bo me di dauê de navbeynkariyê dike. Ji ber vê yekê gunehê wî çi qas mezin be bila be, her kes dema vegere Xwedê dikare bigihêje dilovaniya Wî.

Dema Îsa Mesîh ji rûyêrdê veqetiya şagirtên Wî êdî Wî nedîtin. Lê belê deh roj li pêy bi ezmanan ve hilkişandina Wî, dema digel hev civiyan Îsa diyariya Ruhê Pîroz ji wan re şand. Ji wan re waad kir ku dê bi hêza Ruhê Pîroz her dem li her cihî Ew dê bibe şahidên wan. Ev waad heta îroj jî tête cih.

1 – Çil roj piştî vejîna Mesîh çi qewimî?

2 – Navbeynkarê di nava Xwedê û Mirovan de kî ye?

ÎSA MESÎH ŞIVANÊ QENC E

"Ez şivanê qenc im. Şivanê qenc di oxra mîhên xwe de canê xwe dide." *(Yûhena 10:11)*

Dema Mesîh li rûyêerdê dijiya gotibû ku Ew Şivanê Qenc yê di oxra mîhên xwe de canê xwe dide yî. Ma gelo we keriyek mîh dîtine? Mîh ajaleke nerm, bi rîsê germ in û nêrînên wan nermik û biaram in.

Mîh aferîdeyên gellekî lawaz in. Mîna gur û hirçan, nikarin li daristanê tena xwe bijîn. Mîna roviyan ne fenek in ku xwe ji nêçîrvanan veşêrin. Mîh ajalên pêdiviyên wan li nêrînê hene, lawaz û kedîkirîne. Divê mirov mîhan bibin çolteran û rexên avan û ji guran wan biparêzin. Ger şivanek ne li serê wan bin, mîh gellekî bi hêsanî winda dibin, bi deviyan ve dipelkin an jî ji ajalên hov re dibin xwarin. Mîh tena serê xwe nikarin rêya rast an jî govên xwe bibînin. Her tim pêdiviya wan ji şivanekî re heye.

Kitêba Pîroz ji me re dibêje ku hemî mirovên li dinê bi Xwedê re bawer nakin, mîna mîhên windayî ne û şivanê wan nîne ne. Dilê Lawê Xwedê bi gunehkarên wenda re şewitiye. Bona li rûyêerdê wendayan bibîne û wan bibe buhuştê, digel Bavê xweyî ezmanî hatiye. Îsa bona hemî mirovên deng didin banga Wî û bi Wî ewle dibin dibe şivanek.

Îroj Şivanê Qenc li wendayan û li yên di deviyan de tilpekî bûne digere. Şivanê Qenc, tu carî tu kesî ber ve xeyalşikestinê nabe û tu kesî jibîr nake. Dixwaze he-

miyên winda bûne xelas bike û wan bibe buhuştê. Ger Ew nebe, tu kes nikare rêya ku diçe buhuştê bibîne.

Ger hûn jî bixwazin bibin mîhê Xwedê, hûn dikarin vêya ji Wî re bibêjin û Ew dê we jî qebûl bike.

1 – Ma gelo çima pêdiviya mîhan ji şivanekî re hene?

2 – Gelo ji ber çi Îsa navê Şivanê qenc daye xwe?

BONA XELASBÛNÊ DIVÊ EM ÇI BIKIN?

"Ma divê bona xelasbûnê ez çi bikim?"
(Karên Şagirtan 16:30)

Paşî ku mirovê pêşîn gunehê kir û dinya kete gunehê, ruhê mirov li şabûnê geriyayî û lê geriyayî. Ne pêkan e ku ruhê gunehkar bêyî dîtina Xwedê aramiyê bibîne.

Guneh, mirov ji Xwedê cuda dike û di têkiliya navbera Xwedê û mirov de kendaleke mezin çêdike. Mirovan di pêvajoya salên dûdirêj de û bi gellek awayî xwestine ku pirekê bi ber vê kendala cudabûnê ava bikin, lê belê tu tiştê ku mirov bi hêza xwe bike wan û Xwedayê wan bi hev re aşt nakin.

Gellek mirov bicihanîna zagonê dixwaze Xwedê dilxweş bike. Hewl didin ku tenê li ber zagonekê jî nesekinin, lê dîsa jî bi awayekî gunehê dikin. Kitêba Pîroz dibêje ku tu kes nikare bi navgîniya karên zagonê li ber Xwedê pak bibin.

Kesên wekî din jî wisa difikirin ku ew bi karên xweyî qenc an jî xêrên ku kirine Xwedê dilxweş dikin. Lê belê mirov her çi qas hewl bidin bila bidin, nikarin bi navgîniya karên ku dikin xelas bibin. Karên qenc tu carî nikarin gunehên me binuxumînin û ji wan girantir jî nayên.

Ol, awayeke gellekî populer ya mirov nêzîkî Xwedê bibin e yî. Gellek mirov difikirin ku ger ola rast bibînin,

bibin endamê civakekî û bona bicîhanîna hemî rêzikan hewl bidin, ew qasî hewldan dê bona xelasiyê bes be. Lê belê di vêya de gellekî dixapin! Tu ol nikare mirov ji gunehê xelas bike.

Her rêyên ku mirov bona bi kirinên xwe bigihêje xelasiyê, serî lê dide, bêçare di biserneketî de bimînin. Mirov ne xwediyê hunera xwe bi xwe xelas bike yî. Ger mirovan bikarîbana xwe bi xwe xelas bikirana, pêdivî nedima ku Îsa ji buhuştê veqete û bi jan û êşkişandinê bimire. Tenê rêyeke xelasiyê heye û zarok, mezin, her kes dikarin lê bigerin û bibînin. Gelo em ê çawa bikaribin wê rêyê bibînin?

BI XWEDÊ VE BAWER BIBIN

"Ez ya rast ji we re bibêjim; jiyana abadîn ya kesê bawerkirî heye." *(Yûhena 6:47)*

"Wan, baweriyê bi Xudan Îsa re bîne tuyê jî maliyên te jî, hûn ê xelas bibin, gotin." *(Karên Şagirtan 16:31)*

"Wisa tê ku, bawerî bi bihîstina gotinê û bihîstin bi navgîniya gotina Xwedê ve dibe." *(Romiyan 10:17)*

Xelasî ne ku karê mirov pêk tîne, lê karê Xwedê dibe serî ye. Pêdivî nîne ku mirov bifikirin û ji xwe re rêyeke xelasiyê bibînin an jî bona tiştekî xelasiyê bide wan bixebitin. Tenê divê mercên Xwedê di Kitêba Pîroz de têgîhandine qebûl bikin. Merca pêşîn an jî gava pêşîn

ya divê mirov bavêje jî bi Xwedê û Kelama Wî re bawerî anîn e. Guneha pêşîn ya mirovan bêbawerî bûyîn bû. Hawa ji ber Gotina Xwedê ketibû gumanê: Gelo Xwedê birastî jî ya rast e gotibû? Ger ji fêkiyê qedexe bixwin dê bi rastî jî bimirin? Bêîtaetî bêbaweriyê şopandibû. Hawa fêkiyê rahiştibû, xwaribû û hinekê jî dabû Adem.

Mirov ji ber bêbaweriyê jiyana ruhanî winda dikin û em jî tenê bi navgîniya baweriyê dikarin nêzîkî Xwedê bibin. "Lê belê bê bawerî, meqbûl bûn bêderfet e; ji ber yê ku nêzîkî Xwedê bibe, divê bawerî bîne ku ew heye û dê yên li wî digerin, xelatdar bike" (Îbraniyan 11:6). Bêyî baweriyê em nikarin Xwedê dilxweş bikin û bêyî baweriyê tu kes nikare xelas bibe.

Ka gelo em ê çawa bibin xwedî bawerî? Kitêba Pîroz dibêje bawerî bi bihîstina Mizgîniyê, bihîstin jî bi belavbûna gotina di derbarê Mesîh de ye. Ger hûn Kitêba Pîroz bi awayekî balkêşî bixwînin, hûn ê banga Îsa ya dibêje: "Werin digel min, ez ê xelasiyê bidim we!" bibihîzin. Bawerî bi îtaeta Kelama Xwedê destpê dike.

1 – Divê mirov di rêya xelasiyê de kîjan gavê pêşiyê bavêje?

2 – Bawerî ji ku tê?

JI GUNEHÊN XWE TOBEKIRIN

"Wê gavê bona gunehên we paqij bibin tobe bikin û vegerin Xwedê." *(Karên Şagirtan 3:19)*

Gava duyem ya di rêya xelasiyê de divê bête avêtin, gunehkarbûna xwe qebûlkirin û li ber Xwedê tobekirin e.

Qebûlkirina gunehkarbûna xwe ne karekî hêsan e. Bi gelemperî mirov dixwazin ku xwe mafdar derxînin. "Ez ne mirovekî ew qasî xerab im. Gellek mirovên ji min xerabtir hene. Min tu kesî nekuşt. Tu carî tiştekî nedizîm…" dibêjin.

Lê belê Xwedê dibêje ku hemî mirovan gunehê kirine û ji ber gunehên xwe mirinê li xwe heq kirine. Ger hûn bi vêya bawer bin, divê hûn fam bikin ku, hûn jî ji gunehkarên divê bi mirina abadîn bête cezakirin in. Ya ku vêya ji we re têdighîne dilovaniya Xwedê yî. Xwedê bona ku hûn xwe bi rastî jî çawa ne bibînin bi navgîniya Ruhê xweyî Pîroz çavên we vedike.

Hûn dixwazin Kelama Xwedê tune bihesibînin û di nava yên ku tune dihesibînin de bimînin û dixwazin jî çokên xwe deynin û gotina: "Belê, ya Xudan, ez gunehkarek im! Li min bibexşîne. Ji ber ku ji te hez nekirim û gellekî xerabiyê kirime gellekî xemgîn im. Min îtaetê ji te re nekir, kesên wekî din xapandim û bûm sedema xeyda wan, gotinên xerab gotim. Ez dizanim tu bona min bû qurban. Min ji hemî xerabiyan xelas bike. Ya Îsa, ez ji te dixwazim ku tu dilê min paqij bike, min

mîna yek ji zarokên te ne qebûlkirinê û min bibe buhuştê! Amîn" hilbijêrin.

Îsa dixwaze duayeke wisa bibihîze. Li hemiyên wendayî û bi gunehê ve qirêjbûne digere û wan bangî digel xwe dike. Îsa destê xwe dirêjî mirovên di nava gunehê de ne dike û wan xelas dike.

Lê belê tobe ne her tişt e…

1 – Gava duyem ya di rêya diçe Xwedê de divê em bavêjin çi ye?

2 – Ki bona gunehkarbûna xwe fam bikin alîkariyê bi me re dike?

JI GUNEHÊ VEGERIN

"Niha her xerabiyê û her fenekî û durûtiyê, çavnebariyan û hemû bêbextiyan ji ser xwe bavêjin û ger we qenciya Xudan tahm kiribin, mîna pitikên nû bûyî ne, bêriya şîrê ruhanî, yê bêhîle bikin, da ku, hûn bona xelasiyê bi wê ve mezin bibin." *(1. Pêtrûs 2:1-3)*

Paşî ku we ji Xwedê bexşandina gunehên xwe xwestin divê hûn pişta xwe bidin gunehên xwe û bi hemiya dilên xwe vegerin Xwedê. Ev jî tê wê wateyê ku hûn êdî nikarin mîna berê tev bigerin. Ger berî tobekirinê we qerfên xwe bi kesên din anîbin, derewan ji wan re gotibin û heqaretê li wan kiribin, ji mirovên ku dilên we şi-

kandine di her fersendê de bona tolhildanê hewl dabin û her cûreyên xerabiyê kiribin, divê jiyana we niha bi awayekî cihê be. Divê êdî hûn bi hemiya hêza xwe bona xizmetkirina Xwedê bixebitin û ji cihê ku gunehkirin hêsan e dûr bisekinin.

Ger gunehên we xesarê dabe mirovên din divê hûn berdêla xesarên wan bidin. Ev jî di wateya, lêborînê ji mirovên ku we xerabiyê bi wan kirine xwestin û bi wan re heta ku ji dest were navberê qenc girtinê de ye. Bi vî awayî dê li ber Xwedê û mirovan wicdanê we di aramiyê de be.

Xwendina Kelama Xwedê dê hêz û xurtayiyê bide me û ka em ê çawa rast bijîn, ji me re dighîne. Kitêba Pîroz dê bona jiyana kesê ku tobe kiriye, vegeriyayî Xwedê û ji aliyê ruh ve zindî ye, bibe pîvan, bona rê cihnuma û xwarina rojane. Ger hûn Kelama Xwedê bavêjin paş guhên xwe, di navbera demeke kurt de ji aliyê ruh hûn ê bimirin û ji Xwedê re biyan bimînin.

Bo vê yekê bi Xwedê ve bawer bibin, gunehkarbûna xwe qebûl bikin û li ber Xwedê tobe bikin. Gavên ku bona xelasbûnê hûn bavêjin vana ne. Îsa Mesîh li benda we ye. Naskirina Wî paşde nevêjin.

1 – Bona xelasbûnê gava ku li pêy tobê divê bête avêtin kîjan e?

2 – Kitêba Pîroz çawa nêzîkbûyîna me û Xwedê pêk tîne?

BI BAWERIYÊ XELASIYÊ QEBÛL BIKIN

"Ji ber ku hûn bi rêya baweriyê, bi xêrê ve xelas bûn û ev ne ji we, xelata Xwedê ye. Bona ku kes pesnê xwe nede, ne ji dawiya karan e." *(Efesiyan 2:8,9)*

Biçûk û mezin her kes ji standina diyariyê hez dikin. Dema yekî diyariyekê bide we, ma gelo tu carî berdêla wê diyariyê ji hişê we derbas dibe? Helbet na! Hûn ê ji kesê ku diyariyê daye we rêzdar bin lê belê tu carî berdêla wê diyariyê dayînê nefikirin, ji ber ku ew diyarî ye. Bêberdêl ji we re hatiye dayîn û di berdêla wê de kes pere ji we naxwaze.

Xelasî diyariya Xwedê ya ji mirovan re ye. Diyariyek pirr birûmet û giranbiha ye. Îsa berdêla xelasiyê bi canê xwe daye. Hûn nikarin bona xelasiyê li xwe heq bikin bixebitin û wê bistînin. Hûn hew dikarin mîna diyariyekê bigînin wê bistînin.

Ger we baweriyê bi Îsa Mesîh û gotinên Wî ve anîbin, gunehkarbûna xwe qebûl kiribin û li ber Xwedê tobe kiribin, hûn dikarin bawerbin ku we diyariya xelasiyê stendine. Divê hûn bi tiştên ku di Kitêba Pîroz de nivîsandî ne, yanê bi Xwedê li gunehkarên tobe kirine dibexşînin û jiyana abadîn dide wan, bi hemiya dilê xwe baweriyê bidomînin.

Gunehkarên ku vegeriyane Xwedê û xelasiyê girtine dibin pîroz û navê zarokên Xwedê an jî berxikên Îsa li wan tête kirin.

Dibe ku hûn bi gotina: “Lê belê ez gellekî gunehkar im. Ne liyaqî vê diyariyê me” difikirin. Lê tu carî ji bîr nekin ku Îsa bona gunehkaran, gunehkarên mîna we pêdiviya wan ji xelasiyê hene, xelas bike hatiye. Tu kes xelasiyê li xwe heq nake û tu kes bona diyariya xelasiyê li xwe heq bike tiştekî nake.

Xwedê vê diyariyê, li heqkirin û nekirina me nanihêre, bi hezkirin û dilovaniya xwe dide.

Kitêba Pîroz dibêje ku: “Hûn bi rêya xêrê xelas bûn. Xêr, dilovaniya ji Xwedê ve tê û nehatiye heqkirin e. Em ji têkçûna abadîn bi saya xêra Xwedê hatin xelaskirin!

1 – Gelo ji bo çi divê em bona xelasiyê tiştekî nedin?

2 – Ma gelo hûn dixwazin ji têkçûna abadîn xelas bibin?

JI XWEDÊ RE DI NAVA ÎTAETÊ DE BIJÎN

"Û Ew di oxra her kesî de mir; da ku, yên dijîn bila êdî ne bona xwe, lê belê bona yê ku di oxra wan de miriye û vejiyaye bijîn." *(2. Korîntiyan 5:15)*

"Lê belê şikir be ji Xwedê re ku, mîna hûn qûlên gunehê bûn, lê li gor sûretê hînkariya ku hûn jê re hatine radest kirin we ji dil îtaet kir." *(Romiyan 6:17)*

Ger we bi gotina Xwedê bawerîanînê ji gunehên xwe tobe kiribin û bi baweriyê xelasiyê girtibin, wê gavê Îsa Mesîh niha êdî Xudan û Xelaskerê we ye jî. Navê we, tevî yên bi xwîna Îsa Mesîh xelasbûne re li Kitêba Jiyanê hatiye nivîsandin. Xwezî li we! Kitêba Pîroz têdighîne ku milyaketên li buhuştê ne ji ber xelasiya we şa dibin. Dê roja ku hûn digel hemî pîrozan bikevin abadîniyê. Hûn ê bi çavên xwe Xwedê bibînin û heta abadîniyê digel Wî bijîn.

Niha li ber we rêyek nû ya nayê zanîn heye. Bêyî alîkariya Xwedê di wê rêya de meşîn ne pêkan e. Dê Îblis bixwaze ku we vegerîne jiyana we ya kevin û divê hûn tevî xapandinên din bi azwerî û hînbûnên xwe yên xerab jî têkoşînê bidin.

Hûn dikarin diyariya xelasiyê winda bikin, divê hûn bi puxte wê biparêzin. Parastina diyariya xelasiyê ne hêsan e, lê belê ger hûn bi hemiya dilê xwe ji Xudan hezbikin û bi hemî hêza xwe mîna jiyana ku Kitêba Pîroz daye fêrkirin bijîn, dê Xudan alîkariyê ji we re bike. Ev jî tê wê wateyê ku, dema di her tiştî de we ji Xwedê re

îtaet kiribin, dê Şivanê Qenc her tim bi we re be û we tu carî neterikîne.

Kitêba Pîroz, bitaybet jî Încîla piştî ku Îsa li rûyêerdê jiyaye hatiye nivîsandin her roj bixwînin. Încîla Peymana Nû ye, di roja me de bona jiyana Xirîstiyan rêber e.

Bi balkêşî bixwînin, tiştên ku we xwendine di bîra xwe de bînin û hewl bidin ku li gor tiştên ku li wê nivîsandîne bijîn. Ger hûn gunehê bikin, bila dilawêriya we neşikê; ji Xwedê bona xwe bexşandinê bixwazin û di dahatûyê de ji gunehê dûr bisekinin. Dua bikin, her tim ji Xwedê alîkarî û hêza ji Gotina Wî îtaetkirinê bixwazin. Wî waad kiriye ku dê digel we be û heta abadîniyê rênîşanî we bide!

1 – Bona ku biçin buhuştê, divê em çawa bijîn?

GER WE HÊ NÛ DEST BI ŞOPANDINA ÎSA KIRIBIN

"Yê ku baweriyê bîne û îmad bibe, dê xelas bibe; lê belê yê ku bawer neke, dê mehkûm bibe."

(Marqos 16:16)

"Ez ê li ser vî zinarî Dêra xwe ava bikim û dê hêza deriyên welatê miriyan pê nikaribe." *(Meta 16:18)*

Kesê ku di jiyana xwe ya rojane de Îsa dişopîne dê bixwaze ku bi bawermendên din re jî di nava pardariyê de be. Dê bona xwendina Kitêba Pîroz, duakirin

û bi Xudan û Xelaskerê xwe re peristinê, pev re qesîde gotinê bi wan re were digel hev. Pardarî û hînkariyê bi bawermendên din re hevrebûn, bona her bawermedî dê gellekî alîkarê di baweriyê de zexm sekinandinê be.

Navê dêrê li civaka van mirovên ku ji vê dinya xerab ve bang bona derve li wan hatine kirin û bona Xwedê wan veqetandine, dikin. Ev dêran, demek kurt li pêy bi ezmanan ve hilkişandina Îsa, ji toja Pentîkostê ya ku Ruhê Xwedê ji bawermendan re hate dayîn ve hene. Di roja me de jî dêr hene û dê heta dawiya demê jî hebûnê bidomînin.

Xwedê wisa pêşniyar kiriye ku şopînerên Îsa, yên nû welidîne wekî bi avê ve îmadkirî ji aliyê dêrê ve bêne qebûlkirin. Îmad, di derbarê mirov dawî daye jiyana xwe ya kevin ya gunehkar û xwe bona jiyaneke nû nezirandiye de, li ber Xwedê û mirovan şahîdiyek e. Îmad wisa dide xuyakirin ku mirov êdî di Mesîh Îsa de afirek nû ye. Tiştên kevin derbas bûne û her tişt nû bûne. Ev mirov êdî li dêvila zewqa gunehê ya kurt didome tahm bike, bi gelê Xwedê re yekbûyînê û jankêşanê dibijêre. Îmad, li ber Xwedê bersiva wicdanekî paqij daye yî û sembola mîna Rûhê Pîroz bi ser wî kesî dirije yî.

Em dixwazin ku, di derbarê mijara Îsa û şopandina hemî hînkariyên Kelama Xwedê de, bona ku hûn civakek bawermendan bibînin we teşwîq bikin. Tevlî civakek bawermendan ya wisa bin. Heta ku hûn bijîn, bibin dilsozê Mesîh û dêra Wî. Xwedê di vê jiyana we ya nû ya bi Wî re ye de we pîroz û berdar bike!

Xwendevanê hêja, ger hûn bixwazin bigihêjin jiyana bêdawî, hûn dikarin duaya li jêr e bixwînin û bi hemûya dilê xwe ji Xwedê re bibêjin. Dê Xwedê duaya we bibihîze û wê qebûl bike!

"Ya Xelaskerê min Îsa Mesîh; ez gunehkarbûna xwe û bona gunehên min, qurbanbûna Te ya li ser xaçê ye qebûl dikim. Tu Xelaskerê min î! Yê ku jiyana bêdawîn dide Tu yî! Niha jî were jiyana min. Û di jiyana min de bibe Xelasker û Rêberê min. Ez bawer dikim ku Te li gunehên min bexşandiye û jiyana bêdawîn daye min. Ez heta hetayiyê spasiyên xwe pêşkêşî Te dikim. Amîn."

Xwendevanê hêja, di derheqê vê Pirtûka ku we xwendiye de, çi pirs û fikrên we hebe, bi nameyekê an jî maîlekê bigehînin me. Em ê bi dilxweşî bona bersivdana pirsên we bixebitin.

Navnîşana me ev e:
Incilkurd@web.de
Hoffnung und Leben e.V.
Postfach 101382
33513 Bielefeld
Germany